


Koronayê rawestîne!

KURDİSCH-KURMANDSCHI

Maskeyê dayne!



Navbirê berçav bigire!



Destên xwe bişû!



Lêzanînen girîng

Maskeya dev û poz

Maske ne tenê kes bixwe, belkî nemaze kesên din ji ji tûşbûna bi nexweşiyê diparêze.

Yekemayetiya qedexebûnê bi vî awayî ye:

Ji kerema xwe navbira fizîkî berçav bigire.

Hin xal derbarê lixwekirin û Jixwekirinê

Bala xwe bide ser van babetan:

Beriya lixwekirinê, destên xwe bi sabûnê bişû.

Danîna maskeyê:

- Benikên maskeyê bigire, wê li ber rûyê xwe ragire û benikan bikişîne paş guhên xwe.
- Dema danîna maskeyê, dev, poz û çenê xwe bi tamî binixûmîne.
- Bi têliya mezin û têkiliya amajeyê maskeyê ber bi jêrê heta ser çeneyê bikişîne û maskeyê li ser bêvilê xwe qahê bike.

Rakirina maskeyê:

- Dema rakirina maskeyê destê xwe nede aliyê wê yê derveyî.
- Maskeyê ji aliyê paş wê rake: Jibo vî karî her du bendikên maskeyê hevdem bi destê xwe ber bi pêş va bikişîne.

Piştî rakirina maskeyê, destên xwe bi tamî û deqîq bi sabûnê bişû.

Têbînî: Destê xwe nede maskeyê û wê nekişîne.



Benikên xelekî bikişîne paş guhên xwe an li paş serê xwe bi awayê papiyonî girê bide, bi awayekî ku maske tam li rû bizzelîqe.



Dem a rakirina maskeyê heta asta pêkan rûyê wê yê derveyî nepelîne. Karê herî baş ev e ku bendikên xelekî bigirî.

Hin xal û babetê derbarê danîna maskeya dev û poz

Paqijkirina maskeya dev û poz û maskeyên pirrcarî:

Makîneya kincşok, Ferr

- Maskeyênpirrcarî piştî tîndanê (germkirinê) dîsa dikarin bên bikaranîn.
- Maskeyên devî nav cihên sergirtî weke hundira pakêtekê an telîsa plastîkî daneyne, ji ber ku renge li wir zuha nebin.

Maskeyên nivîşkan an lewitî bilez bavêje dûr.

Beriya danîn û rakirina maskeyan, hertim destên xwe bi tamî û deqîq bişû.

1. Di pileya 60°C û paqijkera bihêz bişû

Maskeya xwe ya pirrcarî di germahiya herikêm 60°C li nav Makîneya Kincşok bişû û paqijkera bihêz bi kar bîne.


2. Maskeya xwe ya pirrcarî

li nav tabekê bi ava kel bi qasî pênc deqîqeyan bikelîne

3. Makeya pirrcarî li nav ferê (Mikrofer) zuha bike

(Maske divê li hemberî tîna germayê qahêmbel!)

Tînderê (fer) pêştir bi qasî 10 deqîqeyan di germahiya 80°C germ bike. Maske Maskeya xwe ya pirrcarî li nav tînderê bi qasî herikêm 30 deqîqeyan zuha bike.



Hin xal derbarê guherîna hewayê malê

Hewayê atmosferê divê were guhertin. Jibo vê yekê karê herî baş ev e ku hemî derî û pencereyan vebiki (Guhertina dualî) û ji bilî vê yekê (heke heye) jibo zêdebûna gerîna hewa, hewakêşekê bixebitîne.

Pirtikên heyî li hewa riya gengaz a veguhestina Vîrûsa Koronayê ne û ewna nemaze di cihên sergirti bîlez di tevahiya atmosferê da tîn belavkirin.


Pirtikên heyî li hewa hûredilop in ku li nav hewa digerin. Em van pirtikan dema bêhnkişandin, axaftin, sitirîn û pişkîne derbasî hewa dikin.

Hewayê malê çend caran di rojê da û her carî bi qasî herikê 10 deqîqeyan biguherîne.


- Her çin pirtir, baştir -

Hewa bi vî awayî bi durustî biguherîne:

Her rojê bi qasî 3 an 4 caran Guherîna hewa ya dualî baştirîn halet e



Aşxane+Serşok: Hilma avê rasterast bi guherîna hewa derxîne




Şûştina destan

Şûştina destan karekî bibandor û xwerû ye,
ku renga pêşî li veguhezîna nexweşiyê bigire.

Destên xwe berdewam û bi tamî bişû.

Destên xwe ne tenê dema bi aşkiratî lewitî ne,
belkî nemaze di demên jêrê da bişû:

- dema çêkirina xwarekan û amadekirina goştê xav
- Pêş û piştîxwarina xwarekê
- dema têkiliya bi kesên nexweş û dermankirina birînan
- derdem piştî hatina bo malê
- Piştî her cara çûyîna bo destavê
- piştî guherîna paçîk û pûşkên zarokan
- piştî paqijkirina difînê, kuxîn an pişkînê
- dema têkiliya bi bermahîk, heywan û xwareka heywanan



Şûştina destan pêwîstî bi şêwaza tevgeriyana deqîq e

destên xwe yê nî bi tamî û deqîq bi sabûnê werde.

- Kefa destan
- Paş destan
- Serê tiliyan û neynokan
- Navbera tiliyan.

Şûştina tam û deqîq a destan ji 20 heta 30 çirke dem dibe

Destên xwe bi diqet zuha bike.

Tamiyên zêdetir û sûdmend ên paqijiyê ... Malê bi awayekî baş paqij bike

Paqijiya li Malê di hemî atmosferan da pirr girîng e.

- Bistiyên derî, kilîtên elektrîkê, telefona malê, alavên kontrol ji riya dûr û astên din ku piranî ji aliyê destê kesan va tên pelandin. Ji ber vê yekê li Mala (Haushalt) hevpar, her rojê wan bi destmalekî şil paqij bike.
- Aşpêxane, hemam û destavê her rojê bi paqijkereke heyî li bazarê paqij bike.
- Destmalên paqijiyê yên cuda jibo odeyên rûniştin û razanê, aşpêxane, hemam û destavê bi kar bîne. Heke jibo her yek ji atmosferan, rengên ciyawaz ên destmalên paqijiyê were bikaranîn, dê sûdmend be.
- Atmosferan û cihan ji jorê ber bi jêrê va paqij bike. Kefa erdê di dawiyê da.
- Destmalên paqijiyê piştî bikaranîna li ber hewa daliqîne û bihêle bila baş zuha bibin, Ji ber ku hokarên nexweşçêker di cihên şil da bi başî zêde dibin.
- Destmalên paqijiyê herikêma carekê di hefteyê da di germahiya 60°C bi podreya kincşûştinê ya bihêz bişû.
- Destmalên feraqşûştin û destmalên paqijiyê, her wiha hole, lifên hemamê, lihêf û rû-balgehî û binkiranan di germahiya herikêma 60°C bişû. Podreya kincşûştinê ya asayî têrê dike.
- Jibo kincên normal bi giştî pileyên germayê yên şûştinê yên nizimtir têrê dike, hiç bernameyêke kêma-lêçûn bi kar neyne.
- Firçeyên didanan bi berdehamî her 2 heta 3 mehan, piştî qerisînê (zekem) heta zûtir, biguherîne.
- Heta radeyan pêkan, holeyên destan ên kesane bi kar bîne **û!** Holeyekê bo tevahiya malbatê bi kar neynin.

Berçavgirtina mentiqî
Paqijiya destan baştirin
kiryar jibo pêşilêgirtin li veguhezîna
hokarên nexweşçêker - heta
bo astan an bi riya astan e.



Tamiyên zêdetir û sûdmend ên paqijiyê ... Paqijiya aşpêjxaneyê

Paqijiya baş nemaze li aşpêjxaneyê bi mebesta pêşilêgirtin li veguhestina mikrobên nexweşîçêker gelekî girîng e. Şûştina berdewam û tam a destan dema pêkanîna karên aşpêjxaneyê bi awayê bibandor rê li ber veguhezîna hokarên nexweşîçêker digire:

- › beriya amadekirina xwarekê,
 - › navbera qoonaxên kar,
 - › piştî têkiliya bi madeyên xav ên xwarekê,
 - › beriya amadekirina xwarekên ku bi awayê xav hatine bikaranîn,
 - › piştî têkiliya bi bermahîkan ra.
-
- › pakêtên goştê sor û goştê mirîşkan bilez dûr bavêje.
 - › Hole, destmalên feraqşûştinê û sfencan herikê carekê di hefteyê da û heke lewitîn û gemarî tê dîtin, biguherîne.
 - › Destmal û sfencan di pileya germayê ya herikê 60°C bişû (Kisikeke torî ya şûştinê jibo sfencan baş e).
 - › Di makîneya feraqşûştinê da, avxurk, perdax, feraq û çengal û amûrên aşpêjxaneyê di germahiya herikê 60°C da bişû.
 - › Dema şûştina feraqan bi destê xwe heta ku pêkan e, derdem piştî xwarina xwarekê feraqan bişû, ji ber ku di germahiya odeyê da gelek hokarên nexweşîçêker pirr bilez tî zêdekirin.
 - › Paqijkerên aşpêjxaneyê bi kar bine ku jibo beşa madeyên xwarekê piştrastkiri ne.
 - › Tevahiya amûrên kar ku di têkiliya rasterast digel madeyên xwarekê ne (weke textên birinê, amûr, kêr, ast) her rojê û piştî bikaranînê paqij bike.</
 - › Destmalên paqijiyê yê cuda jibo feraq, astên karkirinê û kefa erdê bi kar bine.
 - › firçeyên feraqşûştinê yê nav Makîneya Feraqşok paqij bike û carinan wan biguherîne.
 - › Toz û tepa Sarincê bi awayê hefteyî bi destmalekî paqij bike.
 - › Satilên bermahîkan berdewam vala bike û herikê carekê di hefteyê da û heke gemariyeke aşkira heye, bi destmalekî şil paqij bike.

Xala girîng:

Destûrkara pîvandîne jibo madeyên paqijker ên bikarhatî berçav bigire!

Tamiyên zêdetir û sûdmend ên paqijiyê ... Paqijiya tiştên xwarinî

Şuştina destan rêzika herî girîng jibo paqijiyê di dema bikaranîna madeyên xwarinî ye

Tenê bi destên paqijî nêzikî madeyên xwarinîyê bibe, da ku hemî endamên Malê saxlem û tendurust bimînin.



Beriya aşpêjîyê:

- › porê xwe li paş serî girê bide, hûçikên xwe hilde û xemlên xwe derxîne.
- › Birinên servekirî bi bandaja dijî avê binixûmîne.
- › Goştê xav bi awayekî cuda amade bike da ku bakteriyên zîyanbar veneguhezîna madeyên din ên xwarinîyê.
- › Textên birrinê jibo cûreyên madeyên xwarinîyê bi kar bîne. Rengên ciyawaz dikarin sûdmend û bi mifa bin.
- › Madeyên xwarinîyê ku bi awayê xav tîna bikaranîn, bi tamî û deqîq bişû.

Dîsa jî xaleke girîng:


- › Jibo testkirinê tenê kevçiyekê bi kar bîne.
- › Ser xwarekên amade binixûmîne, ji ber ku hokarên nexweşîçêker bi riya mêşan va vediguhezîna madeyên xwarinîyê.
- › Piştî aşpêjîyê, astên karkirinê derdem paqij bike.
- › Heywanên navmalî ji madeyên xwarinîyê dûr bike û dema amadekirina xwarekan jî destê xwe bi ser wan da nekişîne.
- › Paqijiya madeyên xwarinîyê li nav Sarincê jî jibo pêşilêgirtin li veguhestina hokarên nexweşîçêker ji madeyeke xwarinîyê bo madeya din girîng e. Goşt xav bila di qata herî jêrîn, pincar û zebze li qatên navîn û berhemên şîr din qatên jorîn da bîna bicihkirin.
- › Avxurk an qutiyên Konservê yê zîyandîtî (her wiha qutiyên Konservê yê werimî) yê din bi kaar neyne.
- › Têkildarî madeyên Dezenfektekirin û paqijkirinê haya te jê hebe ku ev made jibo beşa madeyên xwarinîyê piştrastkirî bin.

Koronayê rawestîne!

Maskeyê dayne!



Navbirê berçav bigire!



Destên xwe bişû!



Bi piştîgiriya ji dil:

Zusammen gegen Corona.
Wer sich schützt, schützt uns alle!



JOHANNITER



HANAU STEHT AUF HYGIENE

Daxuyaniya nû derbarê rewşê bi awayê rojane:



www.corona-hanau.de

#hanaustehtaufhygiene

#gemeinsamgegencorona

Çavkaniyên Ragihandinê Rêveberiya bajarê "Hanau" | Erkantiya Qeyranê / Koma Tendurustiyê | Am Markt 14-18 | 63450 Hanau bi hevkarîya "Johanniter-Unfall-Hilfe e. V." (Civata tomarbûyî ya Alikarigihandina di bûyeran da a 'Johanniter') | Friedberger Str. 9 | 63452 Hanau. Em ji "Johanniter-Unfall-Hilfe e. V." (Civata tomarbûyî ya Alikarigihandina di bûyeran da a 'Johanniter') jibo berhevkerina çavkaniyên daneyan ên gîştali ku wek bingeha amadekirina vê broşûrê hat bikaranîn, sipasdar in.